

Nexweşî û qeze

Kî li Swîsreyê rûdine, divê sîgorteyeke xwe ya qeze û nexweşiyê hebe. Sîgorteyên taybetî di rewşên qeze, nexweşî yan ducanîbûnê de lêçûnan digirin ser xwe. Divê piştî hatina Swîsreyê di nav sê mehên destpêkê de her du sîgorte werin çêkirin.

Sîgorteya nexweşiyê / Sîgorteya bingehîn

Divê hemû nişteciyên li Swîsreyê bi xwe sîgorteyeke nexweşiyê (Sîgorteya bingehîn, Grundversicherung) bidin çêkirin. Kî were Swîsreyê ji bo vê sê meh dema xwe heye. Ger mirov di van sê mehan de nexweş bikeve, mesref wê bi awayê paş de werin hesapkirin. Sîgorteya bingehîn ji aliyê jimareke zêde yê şirketên sîgorteya nexweşiyê (Krankenkassen) yê taybet ve tî pêşkêşkirin. Hilbijartina şirketa sîgorteya nexweşiyê azad e. Divê ev şirketên sîgorteya nexweşiyê hemû kesên li Swîsreyê dimînin qeyd bikin.

Kesên tî sîgortekirin tibabeke (prîmeke) mehane didin. Ev tibab (prîm) li gor şirketa sîgorteya nexweşiyê û modela sîgorteyê bilind dibe, ji bo wê, divê mirov derfetên ew pêşkêş dikin bide ber hev. Mirov dikare şirketa sîgorteya nexweşiyê herwiha heta dawiya mijdarê ji bo sala bê biguherîne. Sîgorteya bingehîn ne tenê mesrefên gava mirov nexweş bikeve dide, ew ji bo ducanîbûn û zarokanîne jî mesrefan dide. Xizmetên wan bi zagonê hatine diyarkirin.

Baldarî: Divê lêçûnên çêkirina diranan an çêkirina berçavkan bi gelemperî bi xwe bidin an jî di ser sîgorteyeke alîkar a dildarî re werin hesapkirin.

Sîgorteya qezeyê

Kesên di karekî de bi cî bûne, ger di hefteyekê de zêdeyî 8 saetan dixebitin, bi awayekî jiberxwe (otomatîk) ji aliyê karsaz ve li hember qezeyên di dema kar de û di dema vala de tî sîgortekirin. Kesên ji vê kêmtir dixebitin, di demên vala de ne sîgortekirî ne û divê ew bi xwe li ser sîgorteya xwe ya qezeyê rawestin. Ev yek ji bo hemû kesên serbixwe kar dikin û kesên kar nakin jî derbasdar e. Kesên kar nakin, divê xwe li ba şirketa sîgorteya xwe ya nexweşiyê li hember qezeyan sîgorte bikin. Kesên serbixwe kar dikin jî dikarin li ba şirketên din ên sîgortayê ewlekariya qezeyê çêkin. Divê kesên sîgortekirî tibabekî (prîmeke) mehane bidin. Ji bo kesên di karekî de bi cî bûne, ev yek rasterast ji mehaneya wan tê qutkirin.

Kêmkirina tibabê/kêmkirina prîmê

Kesên nikarin tibaba sîgorteya nexweşiyê bidin, di hin mercan de dikarin daxwaza kêmkirina tibaba (prîma) (Prämienverbilligung) sîgortaya bingehîn bikin. Ji bo bidestxistina kêmkirinê, divê mirov formeke serlêdanê bişîne û agahiyên maldarî û hatineya xwe nîşan bide. Ger serlêdan were pejirandin, mirov ji meha bê û wir de kêmtir prîmê dide. Saziya alîkariya civakî li ser kêmkirina prîmê agahiyên dide û qeydkirinê dipejirîne.

Sîgorteyên pêvekî yên sîgorteya bingehîn

Mirov dikare bi awayekî dildarî sîgorteyên pêvekî yên cihêreng (Zusatzversicherungen) ji bo sîgorteya mecbûrî ya bingehîn, bide çêkirin. Ev sîgorteyên pêvekî ji bo mesrefên ji aliyê sîgorteya bingehîn ve nayên dayîn, wek mînak ji bo çêkirina diranan tîn çêkirin. Sîgorteyên pêvekî hema hema ji aliyê hemû şirketên sîgorteya nexweşiyê ve tîn pêşkêşkirin. Şirketên sîgorteya nexweşiyê dikarin bi xwe biryarê bidin, bê ew dixwazin hin kesan sîgorte bikin an nekin û ew dikarin şertûmercan bidin pêş.

Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/krankheit-und-unfall